Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1340 | 15-Sibatê- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165




# Xêzkirina wêneyên Rêber Apo bi dest û hestên zarokan

**Navenda nûçeyan**

**Bi rasthatina roja salvegera Komploya Navneteweyî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan, di bin dirûşma "Kes Nikare Roja Me Tarî Bike" zarokên komîteya Şilêr wêneyên Rêber Apo xêz kirin û li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya bajarê Qamişlo pêşkêşî gel kirin.**

Zarokên bajarê Qamişlo bi xêzkirina wêneyan hest û hezkirina xwe ya ji Rêber Abdullah Ocalan re diyar dikin. Herwiha zarokan got, em dixwazin bi van wêneyan peyamên xwe ji rêberê xwe re bişînin.

Derbarê xêzkirina wêneyan ji destê zarokan û diyarkirina hezkirina wan ji Rêber Abdullah Ocalan re, zarokên ku wêneyên Rêbertî xêz kirine ji me re axivîn û hestên xwe anîn ziman.

### `Daxaza me ewe ku Îsal bibe sala dawî ya dîlgirtina Rêbertî`



Zaroka bi navê Aya Mihemed Ebdilezîz ya 15 salî got, Ji bo şermezarkirina dîlgirtina Rêber Apo ya di 15'ê Sibatê de, min tabloyek rêbertî xêz kiriye. Di tabloyê de min xwest hezkirina xwe ya kûr ji Rêberê xwe re ragihinim. Daxwaza min û tevayiya hevalên min yên zarok û hemû gelên ku li ser xwesteka azadî, rûmet û aşitiyê dijîn ew e ku, ev sale bibe sala dayî ya dîl girtina Rêberê me. Weke hunermendên ciwan, bi xêzkirina van wêneyan pir kêfxweş im, ev yek me teşwîq dike ku hezkirina xwe ya ji bo Rêbertî kûrtir bikin û xebatên xwe yên hunerî û jiyanê bidomînin.

### `Emê bi fikir û ramanê Rêber Apo paşroja xwe ronî bikin`



Zarokê bi navê Şikrî Eyûb jî wiha got: "Ev 2 sal in ez wêneyan xêz dikim. Ez di tabloyên xwe de herî zêde bal dikşînim ser xêzkirina wêneyên Rêber Abdullah Ocalan û niha jî bi nêzîkbûyîna salvegera komployê, min du wêneyên Rêbertî xêz kirin û di pêşangehê de pêşkêş kirin. Wek zarokên bakur û rojhilatê Sûriyê, em Komploya Navneteweyî ya li ser Rêber Ocalan şermezar dikin."

Şikrî got, ji bo ku ez û hevalên xwe hezkirin û xwedîderketina xwe ya ji rêbertî re ji tevayiya Cîhanê re diyar bikin, me ev wêne xêz kirin. Herwiha em sûcê dewleta Tirk û hêzên ku di komployê de pê re bûn alîkar, bi tund şermezar dikin. Lê em ji van kesan re dibêjin, 'girtina Rêberê me roja me tarî nake' û emê li dijî komployê têkoşînê bikin û paşrojeke li ser bingehê Netewa Demokratîk û bi fikir û felsefeya Rêber Apo, biafirînin. Emê bi fikir û ramanên Rêber Apo paşroja xwe ronî bikin. Herwiha emê bi têkoşîna xwe Rêbertî jî, fîzîkî azad bikin. Lewra bê serok jiyan nabe.

# Hewar û govend

**Janet Biehl: Gava ez çûm Kurdistanê, min dît ku rast e, Kurd çi minasebet hebe, çi derfet çêbe, govendê digerînin. Govend beşek ji çanda wan a rojane ye. Ez bawer dikim, govend û reqsa wan bi wan bû alîkar ku karibin vê zilm û bindestiya bi dehan salan jî di ser xwe re bibihurînin, û sax bimînin.**



Ji teorîsyenên ekolojiya civakî, femînîzma ekolojîk, weşanger, hunermend û aktîvîsta dosta Şoreşa Rojava û miletê Kurd, Janet Biehlê, piştî erdhejê bi rojekê bala xelkê bi hunerê xwe xwest bibe ser Efrîna dagirkirî. Wê bi du resman xwest hem felaketa erdhejê çi aniye serê Cindirêsê, nîşan bide û hem jî xelkê ji bo hewarê seferber bike. Piştî felaketê bi rojekê, yanî 7´ê Sibatê wê ev resmên hanê xilas kirin. Piştre jî wê ev resm li ser hesabên xwe yên medya dijîtal belav kirin û da belavkirin.

Janet Biehl ji destpêka Şoreşa Rojava ve bi awayekî çalak destekê ji bo Rojava organîze dike, hem di warê siyasî civakî de û hem jî di warî madî de. Wê hem weke weşanger û werger gelek metnên Tevgera Azadiya Kurdistanê, metnên ji nivîsên Rêber Abdullah Ocalan yan bi xwe ji Elmanî wergerandin, yan jî bi derfetên weşangariya xwe ew weşandin.

Bi hunerê xwe jî ew bêalî nema. Wê encamên seferên xwe yên Kurdistanê her wiha weke kitêbên ilustrasyonan jî belavkirin.

Ji bilî vê, ew gelek caran hin aliyên çanda Kurd jî bi hunerê xwe xêz dike, direngîne.

Di rêzek wêneyên xwe de ew balê dibe ser govendên Kurdan. Wê bi xwe ev dîmenên reqs, govend û dîlanê di dema serdanên xwe yên Kurdistanê de dîtine.

Em di wêneyên wê de dibînin ka Kurd çawa ji bo minasebetên cihê çawa govendê digerînin. Şervanên ku piştî şer bêhna xwe vedidin. Govendên jinan, govendên mêran em dibînin. Wê ne tenê yek rengê reqsê jî xêz kiriye. em dibînin ku hin govendên bi tevgerên hişk ên ciwanan li aliyekî ne. Li aliyê din em dibînin ku wê govendên şahiyan ên cihê jî rengandine.

Em Kurd heger meraq dikin, çima xelkê ji derve evqasî baldarî govendê û adetên govenda Kurdan in, em dikarin berê xwe bidin, ravekirina Janet Bielhlê. Ew dibêje, "Gava ez çûm Kurdistanê, min dît ku rast e, Kurd çi minasebet hebe, çi derfet çêbe, govendê digerînin. Govend beşek ji çanda wan a rojane ye. Ez bawer dikim, govend û reqsa wan bi war bû alîkar ku karibin vê zilm û bindestiya bi dehan salan jî di ser xwe re bibihurînin, û sax bimînin."

**Ozgurpolitika**

### Sudoku: Bersiv 49

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 9 | 2 | 3 | 7 | 6 | 4 | 8 | 1 |
| 3 | 7 | 8 | 1 | 5 | 4 | 2 | 9 | 6 |
| 1 | 4 | 6 | 2 | 8 | 9 | 3 | 5 | 7 |
| 2 | 8 | 5 | 4 | 9 | 7 | 1 | 6 | 3 |
| 9 | 6 | 4 | 5 | 3 | 1 | 7 | 2 | 8 |
| 7 | 1 | 3 | 8 | 6 | 2 | 9 | 4 | 5 |
| 8 | 2 | 7 | 6 | 4 | 3 | 5 | 1 | 9 |
| 4 | 5 | 9 | 7 | 1 | 8 | 6 | 3 | 2 |
| 6 | 3 | 1 | 9 | 2 | 5 | 8 | 7 | 4 |

### Sudoku:Pirs 50

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 4 | 7 | 5 | | 6 | | |
| | | | | 6 | | 2 | | |
| 5 | | | | | 2 | 3 | | |
| 6 | | 9 | | 2 | | | 1 | |
| 8 | | | | | | | | 5 |
| | 4 | | | 8 | | 9 | | 3 |
| | | 3 | 1 | | | | | 2 |
| | | 7 | | 9 | | | | |
| | | 1 | | 3 | 8 | 4 | | 6 |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Ast** | **Pile, rade, derece, sewiye, hîza darax: Dema zimanek nebe zimanê bazarê asta wî dadikeve.** |
| **Dewre** (Erebî) | Beşeke diyarkirî ya zeman: Li saziyê dewreyeke perwerdeyê dest pê kir. |
| **Kurs** (Fransî) | Perwerdeya ji bo demeke diyar ku ji bo xurtkirina behre, jîrbûn û zanebûnê tê dayîn: Em diçin kursa zaravayê hewramî. |
| **Perwerde** | Karê fêrkirina kesekî, yan ajelekî. Perwerdeya dibistanan ya îsal baş bû. |
| **Pratîk** (Fransî) | 1. Tiştên ku bi hêsanî pêk tên. 2. Kesê karekî bi hêsanî û zû çareser dike. 3. Tersê teoriyê: Sozan pir didin lê di pratîkê de pêk naynin. |
| **Rêveberî** | 1. Karê birêvebirinê. Rêveberiya şaredariyê biryara erzankirina nan da. 2. Saziya birêvebirinê. |
| **Rêveber** | Kesê di rêveberiyê de ciyê xwe digire, kesên biryar di destê wan de. |
| **Rêbaz** | Awayê kirina karekî. Reng, şêwe, qeyde, şêwaz. Rêbaza karkirina wî baş e. |
| **Wane** | Demeke fêrbûn û fêrkirinê. Ders: Xwendekar dibêjin waneyên îsal zor bûn. |
| **Zanist** | Pisporî, şarezayî, zanyarî, zanîn, nasîn, ilim. Bijîşkî zanisteke pîroz e. |

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1340 | 15-Sibatê- 2023 | www.ronahi.net/ku/

KOMPLOYA MEZIN A GLADÎO R-4

Abdullah Ocalan

# 24 SALE GELÊ KURD LI ÎMRALIYÊ DÎLGIRTÎ YE Û TEKOŞÎN DIKE



# `Fikrê Rêber Apo serdestiya mêr şikandiye û ala azadiya jinê hildaye`

Di salvegera 24`an ya Komploya Navneteweyî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan de, Hiqûqnas Sewsen Şoman bang li gelê azadîxwaz û jinan kir ku xebatên xwe xurtir bikin û armanca Komplogeran ya têkbirina fikir û têkoşîna azadiyê, vala derxînin.

**Darîn Silê/Lubnan**

15`ê Sibata 1999`an bi komleyekê navneteweyî rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan ji aliyê dewleta tirk ya faşt ve hat dîlgirtin û ev 24 sal in, li zindana Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de ye. Dewleta Tirkiyê ya faşîst rojbiroj tecrîdê girantir dike û derfetê nade malbat û parêzerên wî pê re hevdîtin bikin. Herî dawî 25'ê Adara 2021'ê Rêber Abdullah Ocalan li ser telîfonê bi birayê xwe Mihemed Ocalan re axivî, lê piştî çend deqeyek axaftin hat qutkirin û ji wê demê ve ti agahî ji Rêber Apo nehatiye girtin.

Lê ji ber domandina berxwedan û tekoşîna Rêber Apo, gelê kurd û hemû gelê azadixwaz, fikir û pergala wî ya Netewa Demokratîk, gihaşt gelek welatên cîhanê. Herwiha tekoşîna azadiya jinê û ya li dijî domandina komlo di cîhanê de deng veda. Bi heman armancê gelek insiyatîf û çalakiyên jinan li dewletên derve pêk hatin û jinên ji Misir, Lubnan, Iraq, Tûnis, Filistîn û Sûriyê beşdarî wan çalekiyan bûn. Herî dawî jî, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan, Însiyatîfa Nûn ya azadiya Rêber Apo, di Hizêrana 2022`an de ji aliyê komek çalakvanên Rojhilata Navîn û bakurê Afrîkayê ve, li paytexta Lubnanê (Beyrûtê) hat lidarxistin û heta niha berdewam dike.

Derbarê berdewamkirina kompoya li ser Rêber Abdullah Ocalan ya ku 24 sal pişt xwe hiştin, tecrida giran û belavbûna fikir û ramanê



wî li tevayiya Cîhanê, berdevka Înîsiyatîfa Nûn ya azadiya Rêbertî û çalakvana hiqûqnas ya Lubnanî Sewsen Şoman ji me re axivî.

**`Rêbertî feylesûfekî serdemê yê`**

Sewsen Şoman behsa awayê naskirina wê ji ramanên Rêber Apo re kir û got, min bi rêya pirtûkên Abdullah Ocalan ramanên wî nas kir. Herwiha bi beşdarbûna min ya ji Insiyatîfa Nûn re, hê zêdetir felsefeya Rêber Apo nas kir û min dît ku serkirdeyekî rewşenbîrî û siyasî ye. Lewra Rêber Apo xwedî nerîneke berfireh ya li ser bingehê mirovahiyê ye. Ji bo wê jî bi nêrîna min Rêber Abdullah Ocalan feylesûfekî serdemê ye.

**`Tevayiya jinên ku rêya Rêber Apo dişopînin jinên bi hêz in`**

Sewsen bal kişand ser girîngdayîna rêbertî ji jinê re û wiha pê da çû: "Rêber Ocalan pir girîngî da



azadiya jinê hem di aliyê civakî, rewşenbîrî, siyasî û hiqûqî de hem jî di aliyê parastina cevherî de. Ev baldarî li ser esasê civakeke azadîxwaz, demokrat rêzgirtî hate kirin. Herwiha ji bo piralîbûn û jiyana hevbeş ya aştiyane, bal kişand ser azadiya jinê. Lewra jin ji bo civakek azad kilîta edaletê ye. Herwiha tevayiya jinên ku rêya Rêber Apo dişopînin, jinên bi hêz in û ji bo azadiyê di nava têkoşînê de ne."

**`Fikrê Rêber Apo serdestiya mêr şikandiye û ala azadiya jinê hildaye`**

Sewsan di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku raman û fikrê Rêber Ocalan meraqa wê ji bo naskirina wî zêde kiriye. Herwiha got, fikirê Rêber Apo serdestiya mêr şikandiye û ala azadiya jinê hildaye. Sewsen gotina Karl Mars ya `Eger hûn bixwazin asta pêşketina civakê bizanibin, li rewşa jinê binêrin` bîr anî û got, Rêber Apo komkirina hemû ratiyan e.

Sewsen bîr xist ku armanca komploya li ser rêber Abdulaah Ocalan têkbirina projeya netewa demokratîk û biratiya gelan. Lewra yê vê projeyê ava kir rêbertî bû. Ji bo wê jî naxwazin rêbertî ji zindanê derkeve, da ku gelê azadîxwaz mafê xwe bidest nexe û kurdistanek ser bixwe neyê avakirin.

**`Ramanê Rêbertî bandora xwe li ser gelê cîhanê tevî daye çêkirin`**

Sewsen da zanîn ku yên ku ji ramanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bandor bûne ne tenê Kurd in û got, Rêber Apo bandora xwe li ser gelê cîhanê tevî daye çêkirin. Ji bo wê jî girtina fîzîkî ya Rêber Ocalan bandorê li belavkirina fikrê wî nake, rojbiroj fikir û ramanê rêbertî belavtir dibe, bi taybet di nav jinan de. Lewra jin ronahî û rêya azadiyê bi fikrê wî nas kir.

**`Bi belavkirina fikrê Rêbertî xwedî li keda wî derkevin`**

Sewsen got, Rêber Ocalan bi fikrê xwe jin azad kir, divê jin jî li firkrê wî xwedî derkeve. Herwiha bang li hemû rêxistin û têkoşerên jin yên parastina mafên jinan dikin, kir ku li ser sîstem û ramanên Rêbertî xebatên xwe bidin meşandin û axiftina xwe wiha domand: "Felsefeya wî azadiya jinê bi dest xistiye, ji bo wê jî erkê jinan e ku bi belavkirina fikrê Rêber Abdullah Ocalan, xwedî li keda wî derkevin. Bi xurtkirina têkoşîna azadiyê em Rêber Apo fîzîkî, azad bikin.

Berdevka Înîsiyatîfa Nûn ya azadiya Rêber Abdullah Ocalan û çalakvana hiqûqnas ya Lubnanî Sewsen Şoman di dawiyê de got, emê bi fikir û felsefeya Rêber Apo, rêxistina xwe xurt bikin. **Wek jinên Cîhanê û jinên azadîxwaz, heta ku em rêberê xwe azad nekin em ranawestin.** Çimkî hebûn û azadiya me girêdayî azadiya Rêberê me ye.

# Rêgeha Rast; Sosyolojiya Azadiyê

**Zozan Cizîrî**

**Em mil bidin milê berxwedana Rêber APO, mêjiyên xwe yên di nav propagandayên desthilatdaran de tevlîhev bûyî zelal bikin, perwerdeyeke ekolojîk, civakparêz esas bigirin, ferz bikin.**

Di nav du nivîsên berî niha de me behsa sîstema perwerdê ya çend welatên wekî Fînlandiya, Koreya Başûr, Hollanda, Danîmarka û hwd. kiribû. Di nav de modernîteya kapîtalîst ji bo sîstema perwerdê ya di asta cîhanî de baş û pêşketî kîjan pîvanan li pêş dibîne, me bi qismî diyar kiribû. Li gor pîvanên hişmendiya kapîtalîst, bi qismî behsa ekolojiyê bikin û li ser zanista ekolojîk hinek fakulte vekiribin jî, encama erdheja 6'ê Sibatê metirsiyeke gelekî jiyanî û jandar eşkere kir.

Li Tirkiyê bi hatina AKP-MHP'ê ya ser desthilatê re bi gotina herî rast serdemeke cehaletê hat destpêkirin. Ne perwerde girîngiya xwe ma, ne hawirdorparêzî qîmeta xwe ma, ne civakbûn wateyeke xwe ma. Wek xirbeyên niha her tişt li ser xweliyeke binê xwe vala hat lêkirin. Halbûkî Rêber APO bi rêya her 6 parêznameyên xwe yên li zîndana Îmraliyê nivîsand û gihand derve, her carê hewl da zanista ekolojîk û girîngiya perwerdeyeke civakparêz-xwezaparêz bide me, wisa demildest pêşî li felaketên xwezayê û civakê bigire. Mixabin her carê van nêrîn û hişyariyên ku ji bo civakê xwediyê girîngiyek jiyanî ne, ji aliyê desthilata dewleta Tirk ve bi propagandayên "terorê" hatin astengkirin û qedexekirin. Di encamê de berî çend rojan bi erdheja li Bakurê Kurdistanê, Tirkiyê, Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê jiyan bû, eşkere bû ku yên fikrên azadiyê bi cehaleta xwe ya pereperest asteng kirin û qedexe kirin, bi gotina herî rast qebristan ji tevahî civakê û xwezayê re ava kirin. Lewre mirov dixwaze bibêje; xwezî beriya van rewşên trajîk û jandar ên însanên me jiyan kirin, hişmendiyeke dûrbîn û rastbîn hebûya ku, gelan di zûtirîn dem de berê xwe bida vê nexşerêya Rêber APO. Wê çaxê debe ku mirovahiya li Kurdistanê û Tirkiyê evqas malwêranî û rewşên kambax jiyan nekira.

Bi dilêşiya van bûyeran em dikevin 25 saliya Komploya Navnetewî ya hêzên navdewletî xwestin wekî perdeyeke reş raxin ser mirovahiyê, hiş û mêjiyê me di nav cehaletê de bifetisînin. Tam 25 sal in Rêber APO li hemberî vê zilma desthilatdaran a li ser tevahî civaka mirovahiyê ferz dikin, plan û projeyên wana yên civak û xweza anîne ber hilweşînê berxwedaneke herî dijwar raber dike. Eger em jî dixwazin bi azadî bijîn û nebin qurbanê vê sîstema kujer, şert e em mil bidin milê berxwedana Rêber APO, mêjiyên xwe yên di nav propagandayên desthilatdaran de tevlîhev bûyî zelal bikin, perwerdeyeke ekolojîk, civakparêz esas bigirin, ferz bikin. Binêrin; keda bi deh salan a însanên me bi yek erdhejê re ji dest çû, xaniyên nû kirîn ji wana re bûn qebristan, tî man, birçî man, di nav sir û seqema çilê zivistanê de bêxweyî û perîşan man. Elbet li hemberî vê rewşê dilê me hemûyan êşiya, rondik bi çavê me hemûyan ketin ku mirov çawa bikeve vî halê belengaz. Lê îro şûna girî; ji bo em trajediyên mezintir jiyan nekin divê em demildest Sosyolojiya Azadiyê wek pirtûka pîroz a însaniyetê bixwînin, tê de kûr bibin, xwezaya yekemîn, xwezaya duyemîn rast fêm bikin û xwezaya sêyemîn wek tewazûna navbera însan û xwezaya giştî ava bikin. Eger em vê nekin, elbet xwezaya dorhêla me û hemzemîna em li ser, bêy ku li rondikên çavê me binêre, wê bersivên hîn hişktir bide me.



# Hunermendê Kurd: Emê bi hunera xwe bibin bersiva Komployê

Hunermend Delîl Mîrsaz da zanîn ku Tekoşîna Rêber Apo vejandina çand û mîratê berê ye û got, em hunermend wê bi hunera xwe bibin bersiva komployê û em ê xwedî li çand û fikrê Rêbertî derkevin.

**Darîn Silê/Qamişlo**




Her welat bi çanda xwe tê nasîn. Welatê Kurdistanê jî di warê çand û hunerê de pir dewlemend e. Li bakûr û rojhilatê Sûriyê tevî zor û zehmetiyan, herwiha bi saya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan pêşketineke mezin di warê çandê de çê bû.

Şaristanî ji çandê dest pê dike û di nava çandê de her tişt geş dibe. Di çand û huner de hest şîn dibin û bedewî tê afirandin. Ji ber wê divê mirov çanda xwe pêş bixe û derfetê nede desthi-



latdaran ku rehên civakê lewaz bikin. Çimkî bi windabûna çandê, netew jî winda dibe.

Di dema deshilata Be´es de, Kurdan nedikarî li ser çanda xwe bijîn. Li bakur û rojhilatê Suriyê, berî ku şoreş dest pê bike ti kesî girîngî nedida çand û hunera xwe. Lê piştî destpêkirina Şoreş Rojava, belavkirina fikir û ramanê Rêber Apo yên derbarê çandê de, gel nêzî çanda xwe bûn û ji wê demê ve hunera xwe bi pêş dixin û li çanda xwe xwedî derdikevin. Ji bo wê jî bandora fikrê Rêber Apo pir li ser çand û hunera kurdî heye. Herwiha bi rêya fikrê wî cevherê çanda gelan zindî bû û jiyaneke hevbeş li ser bingehê Netewa Demokratîk tê jiyên.

Derbarê berdewamkirina komploya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bandora fikir û ramanê Rêbertiyê li ser çand û hunera kurdî, hunermend Delîl Mîrsaz nêrînên xwe ji me re anî ziman.

Hunermend Delîl Mîrsaz ku ji zaroktiya xwe ve dest bi karê hunerê kiriye û di gelek komên çandê de cîh girtiye, heta niha jî bi hunera xwe ve girêdayî ye û ji wê demê ve nêzî sed stiran û helbestên bi gelek zimanan çêkirine.

**`Têkoşîna Rêber Apo vejandina çand û mîratê berê ye`**

Delîl destnîşan kir ku fikrê Rêber Ocelan bandorekî mezin li ser xebata çandê kiriye û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Destpêkirina Têkoşîna Rêber Apo vejandina çand û mîratê berê ye. Herwiha bi saya fikrê Rêbertî û bandora wî li ser çandê, tevayiya pêkhateyên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, li hev kom bûn û bi hev re yek berhemî çêdikin."

**`Piştî belavbûyîna fikrê Rêber Apo xabatên çandêxurt bûn`**

Delîl behsa ferq û cûdahiya di canda beriya Şorşê û ya niha kir û wiha got: "Dagîrkeran di warê çandê de heta asteke jor xirabûyîn çêkiribûn û tiştekî kurdan nehiştibûn. Ji bo wê jî li Sûriyê, çanda kurdan ji holê hatibû rakrin, nasnameya kurdan jî hatibû windakirin. Wê demê stranên bi kurdî jî tev hatibûn qedexekirin û nedihatin qeydkirin. Lê her çiqasî dagîrkeran hewl dan jî, nikarîbûn çand û dîroka me kurdan ji holê rakin. Lewra çanda me ya berê pir dewlemende bû û fikr û ramanên me jî, ji Rêber Apo hatiye girtin. Herwiha ne ji fikir û ramanê Rêberîtî bûya, me niha nikarîbû xebat û têkoşînê bikin û li ber xwe bidin. Ji bo wê jî piştî şoreşê û piştî belavkirina fikrê Rêbertî, hunermendên kurd li hunera xwe vegeriyan; gavên pir mezin di warê çandê de hatin avêtin. Heriwha li xwe vegera û li ser koka çanda xwe xebatek bi heyecanekî mezin hat kirin."

**`Em bi rêya hûnera xwe li fikirê Rêbertî û li çanda kurdî xwedî deredikevin`**

Delîl di berdewamiya axaftina xwe de got, jimareke baş stran li ser rêbertî ji aliyê gelek hunermendan ve hatiye çêkirin. Gelek komên hûnerî yên Rojava, Başûr û yên Rojhilat, stran li ser rêbertî çêkirine û ev stran ne bi zimanê kurdî tenê, bi gelek zimanan hatine çêkirin. Heta niha jî em hunermend, stranên li ser rêbertî amade dikin. Herwiha em bi rêya stranên xwe li fikir û felsefeya rêberê xwe û li çand û hunera xwe ya ku bi sayê fikrê Rêbertî vegeriyayî cevherê xwe, xwedî derdikevin. Hewldanên me yên pêşxistina vê çandê jî berdewam in.

**`Emê şopdarên çanda xwe bin`**

Delîl bîr xist ku dijmin ne bi Komploya li ser Rêber Ocelan tenê, bi tang û topên xwe jî êrişî çand û nasnameya wan dike û axaftina xwe wiha qedand: "Dijmin her tim dixwaze ku me ji çand û hunera me dûr bixe. Lê çi dike bi ser nakeve. Lewma li hemberî kiryarên wê bi qehremanî têkoşîn tê kirin. Êrişên ku niha jî li ser xaka me tên kirin, tev bi armanca qirkirin û tinekirina çanda me tên kirin. **Em dibînin dema Dewleta Tirkî ya dagîrker êrişî herêmên me dike, destpêkê êrişî çanda me dike. Niha li bajarên me yên dagîrkirî weke Efrîn û Serê Kaniyê, dagîrker ji her alî ve çanda me ji holê radikin. Bi qutkirina darên zeytûnan, ji holê rakirina berhemên dîrokî û hwd. Çanda me qir dikin.** Lê her ku erişî çanda me dikin, em tekoşîna xwe ya parastinê xurttir dikin. Ji bo wê jî emê li çanda xwe xwedî derkevin, bi taybetî li keda Rêberê xwe û dayîkên ku mîrasa me parastine. Emê şopdarên çanda xwe bin. Lewra çand hebûn û nasnameya mirovan e; di jiyana mirovan de tişta herî pîroz û binirx e."

**`Emê bibin bersiva kompoyê û xwedî li çanda rêbertiyê derkevin`**

Mîrsaz axaftina xwe wiha domand: "Divê herkes li çanda xwe xwedî derkeve, bi taybetî divê jin çanda xwe pêş bixin û kevneşopiyên dayîkan biparêzin. Çimkî pêşengên vê çandê jin in."

Hunermend Delîl Mîrsaz di dawiya axiftina xwe de bang li azadîxwaz, helbestvan, hunermend û rewşenbîran kir ku erkê xwe ya niştimanî û exlaqî li hemberî gelê xwe bi cih bînin û destkeftiyên tekoşîna azadiyê biparêzin û got, eger em bi rastî dixwazin bibin hunermend, divê em destpêkê Rêbertî baş nas bikin û fikrê wî bixwînin.

# Komîn çiye û pêwîste çawa tevbigere?

**Komîn çiye, erkên wê çine û pêwîste her komîn li ser kîjan bingehî kar, xebat û pirsgirêkên taxê çareser bike, herwiha civakê çawa bi rêve bibe?**

**Darîn Silê/Dûaa Yûsif**



Komîn wek stûnê civakê ye. Bi rêya kominan pirsgirêk û xizmetguzariya pêvîst civak bixwe di nava xwe de çareser dike. Bi destpêka avakirina komînan li bakur û rojhilatê Sûriyê, gelên herêmê hewl da vê tecrubeyê bi pêş bixin û çalek bikin. Herwiha gel bi rêya komînê wekhevî û hevgirtinê ji xwe re esas digire û afirîner pêş dikeve. Lewra komîn nimûneya civaka birêxistinkirî ya li derveyî çarçoveya dewletê ye. Komîn roleke giring di hevgirtina civakê de dileyze, erkeke wê ya sereke jî parastina vê hevgirtinê ye. Komîn ne tenê di nav bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê de hatine avakirin, di nav gund û kampên penaberan de jî hatine avakirin. Herwiha erka wê ew e ku civakê bi rêxistin bike, ji ber ku bingeha peydekirin.

Li bakur û rojhilatê Sûriyê, xebatên komînan û rêxistinkirina civakê dewam dike. Herwiha komîn li gor cografiya taxan hatine avakirin. Her 100 yan 150 mal di hundirê komînekê de cihê xwe digrin. Herwiha ji destpêka şoreşa Rojava ve û heya roja îro, gel bi pêşengiya van kominan de li ser bingeha parastina rewa, parastina xwe dike. Beriya ku komîn werin avakirin tu xizmet di nava taxan de nedihat kirin, piştî komînan pêdivî, xizmet û rêxistina gel di nava taxan de pêk tê. Li gorî komîna taxê xizmet tê kirin. Herwiha ferq û cûdahî di navbera her komînê de heye. Lewra hin komîn hene xebata xwe bi awayekî çalek û sîstematîk dimeşînin; di nava taxê de tevayiya pirsgirêkan çareser dikin û

Hisên bal kişand ser rola komînê û giringiya wê ya di nava taxê de wiha nirxand:"Ya herî girîng di nava xebata komînê de hişyarkirina li ser rewşa ewlehiyê ye û rêxistinkirina civakê ye. Pêwîste komîn rewşa heyî bi civakê bide naskirin. Herwiha civakê li ser vê rewşê hişyar bike û wan perwerde bike; bi malbatên taxê re alîkar be û çi pirsgirêk derkeve holê, bi rêya komînê û yekgirtina civakê bê çareserkirin.

**`Pêwîste komîn bi malbatan re alîkar be`**



Şivan da zanîn ku ne tenê di milê perwerdekirinê de, pêwîste di milê xizmetguariyê de jî komîn çalak be û wiha pê da çû: "Di taxê de hin malbat hene rewşên wan yên taybet hene, pêwîste komîn bi wan malbatan re alîkar be û wan bişopînê. Herwiha divê bi malbatên taxê re pêvistiyên malbatên wisa heya astekê bên pêşewazîkirin." Şivan bîr xist ku pêwîste hevserokê

Welatiyê bi navê Ziyad Cemîl Mehmûd yê ji gundê Navkurê yê girêdayî bajarê Qamişlo ku ji komîna wan ya gund, bi navê Şehîd Devrim tê nasîn, li ser xebata komînê û tevgera wê di nava gund de wiha axivî: "Dema pêwîstiya me bi tiştekî hebe em berê xwe didin komînê, da ku pêwîstiya me pêk bîne. Herwiha tevayiya pirsgirêk û nakokiyên gund bi rêya komînê tên çareserkirin."

Ziyad destnîşan kir ku welatiyên li gund tev ji komînê kêfxweşin û pê re alîkarin. Herwiha got, şopandina komînê ji gund re heye. Ji ber ku komîna me bi awayekî rêxistinkirî kar dike. Jiyaneke rêxistinkirî di gundê me de heye. Tevayiya malbatên li gund bi rehetî jiyana xwe derbaz dikin û bi rêya komînê çareseriya her tiştî tê dîtin.

**`Erka birêxistinkirin û birêvebirina civakê tev dikeve ser milê Komînê`**

Welatiya bi navê Hemrîn Şêxo ya ji taxa Kornîş jî behsa komîna li taxa wan ya bi navê Şehîd Qendîl kir û wiha got: "Komîna me tenê di milê belavkirina mazot û xazê de erka xwe pêk tîne. Lê erka wê ne tenê mazot û xaze, gelek erkên wê hene. Erka birêxistinkirin û birêvebirina civakê tev dikeve ser milê komînê."

Hemrîn di berdewamiya axaftina xwe de got, komîna me di milê xizmetguzariyê de pir lawaz e û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Dema em diçin komînê ji bo pirsgirêkek yan ji bo pêwîstiyekê, erka xwe pêk naynin û pirsgirêka me çareser nakin. Ji havînê de ez binesaziya avê li taxa me xirab bûye û em bê avin. Me pirsgirêk gihandiye komînê lê, heta niha komîn ti çareserî ji me re nedîtiye û li ser vê yekê nesekiniye."

Hemrîn di dawiyê de got, em bi hêvîne komîn baş erka xwe pêk bîne da ku malbat jî pê re alîkar bin û li ser bingehê jiyana komînal jiyana xwe bi rêve bibin.

**`Pêwîste kesên ku li ser komînê disekinin karê xwe baş bikin`**

Welatiya bi navê Henan Simaîl ku girêdayî Komîna Şehîd Orhan da xuyakirin ku komîn karê xwe baş nake û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Komînê berê guh nedida gazincên me û pirsgirêkên me çareser nedikir. Herwiha malbatên taxê nedişopand. Ji ber wê jî em êdî ji bo çareserkirina nakokiyên xwe nadiçûn komînê. Herwiha got, danûstandina komînê bi welatiyan re ne başe bû. Lê, niha hevserok hatiye guhertin û rewşa komînê û ya taxê baştir bûye. Ji ber wê jî, pêwîste kesên ku li ser komînê disekinin karê xwe baş bikin. Lewra, ev kes civakekê bi rêve dibin."



Li ser vê hevserokê Komîna Şehîd Orhan yê nû Ehmed Yûnis da zanîn ku hevseroka komînê ya berê karê xwe baş pêk nedianî. Herwiha bal kişand ser girîngiya komunê ji bo pêşxistina hişmendiya çandî, civakî, xurtkirina têkiliyan û hezkirina di nav gel de û got, Emê hewl bidin têkîliyên komîn bi gel re ji nûve ava bikin û xebat û pêwîstiiyên taxê pêk bînin.

**`Emê rihê civakî di nava komînan de xurttir bikin`**



Li gorî komîteya Şopandinê ya kantona Qamişlo diyar bû ku hezar û 200 komîn li kantonê hene û tev di bin çavdêriya komîteyê de ne. Ji bo ku em hê zêdetir xebatên komînan nas bikin Berdevka komîteya Şopandinê ya Kantona Qamişlo Nisrîn Ferman jî li gorî şopandina wan ji komînan re wiha axivî: "Komîteya me ya şopandinê her demê komînan dişopîne. Li gorî şopandinê diyare ku rihê têkiliyên civakî li komînan kême. Jixwe têkîlî bingeha komînê ye. Pêwîste têkîliyên komînê xurtbin û bi rêya têkîliyan civakê bi wê komînê bi rêve bibe. Ji bo wê jî niha em hewl didin ku serdana tevayiya komînan bikin û rihê civakî di nav wan de xurttir bikin. Herwiha da ku danûstandina komînê bi malbatan re zêdetir bibe. Da ku malbat û komîn bi hevre êş û birsgirêkên xwe çareser bikin."

Nisrîn Ferman di dawiyê de got, Komîteyê şopandinê ya bajar her mehê civîn ji komînan re çêdike û rewşa wan dişopîne, herwiha dema pirsgirêkên mezin hebin bi rêya komîteyê tê çareserkirin.




Netewa Dîmokratîk û nûnertiya azadî, wekhevî û edaletê ye.

Ji ber ku komîn nîşaneya jiyana komînal û wekheviyê ye. Pêwîste her komîn di taxa xwe de kar û barê civakê û xizmetguzarî, belavkirina mazot, xaz, paqijî, alîkariya welatiyan û çareserkirina pirsgirêkên wan di milê madî û manewî de, pêk bîne. Herwiha her mehê civîn ji malbatên taxê re çêdike. Di civîna de rewşa dawî ya taxê, daxwaziyên gel û pêşniyarên malbatan werin diyarkirin û pêdiviyên wan werin malbatan bi rêxistin dikin. Taxên ku komînên çalek li gor taxên din ji hemû aliyan ve rêkûpêktir e, herwiha kêmtir piskirikên wan hene. Mixabin taxên ku rola komînê tê de lawaz be ew tax her di nava pirskirêkan de ye û bê rêxistinkiriye. Ev bandorê hem li taxê, li malbatan û li derdorê jî dike. Ji bo wê jî dema ku karê komînê ne serkeftî be, jiyana li wê tax jî serkeftî nabe.

Derbarê kar û xebata komînan de Hevserokê komîna Şehîd Mistefa ya li taxa Hilêliyê Şivan Hesen komînê erka xwe baş pêk bîne û di her alîde civaka xwe esas bigre. Da ku komîn û civak bi hev re taxê bi rêve bibin û ew tax jiyaneke hevbeş û durist bijîn.

Hevserokê Komîna Şehîd Mistefa di dawî de got erka parastina civakê ne tenê li ser milê komînê ye, ev erka welatiyane jî. Ji ber ku xebata komînê ji bo misogeriya parastin û rehetiya gel e.

**`Bi rêya komînê çareseriya her tiştî tê dîtin`**



# Gelên bakur û rojhilatê Sûriyê Komploya Navneteweyî şermezar kirin

Li Qamişlo, Tirbispiyê, Çilaxa , Dîrik , Tilbirak , Reqe , Tebqa , Dêrazorê, Eyn Îsa û herêma Feratê, gelan bi çalakiyên cûda Komploya Navnetreweyî şermezar kirin.

**Navenda Nûçeyan**

Ji bo şermezarkirina Komploya Navneteweyî ku di encamê de Rêber Abdullah Ocalan li paytexta Kenyayê di 15`ê Sibata 1999`an de hat revandin û radestî dewleta Tirkiyê ya dagirkar hat kirin, gelên bakur û rojhilatê Sûriyê li tevahiya bajar û bajarokan dest bi çalakiyên cûrbecûr kirin.

Li bajarê Qamişlo bi dirûşma "Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin", çalakiyeke bi beşdarbûna bi sedan şêniyên herêma Cizîrê li pêşiya Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişloyê li dar xist. Di çalakiyê de axaftin hatin kirin û wêne û pirtûkên Rêber Ocalan hatin pêşandan. Her wiha têkildarî Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Ocalan sînevîzyoneke hat temaşekirin.




Şêniyên navçeya Til Birakê jî bi dirûşma "Azadî û edalet ji Rêber Abdullah Ocalan re" meşiyan. Meş ji pêşiya firina li başûrê navçeyê dest pê kir û li Çerxerêya Şehîdan bi dawî bû. Di meşê de wêneyên Rêber Apo hatin bilindkirin û Kompolya Navneteweyî hat şermezarkirin.

Di heman çarçoveyê de Meclisa bajarokê Hilwa ya navçeya Tirbespiyê bi beşdarbûna bi dehan şêniyan civînek li dar xist. Di civînê de Kompolya Navneteweyî hat nirxandin û di dawiya civînê de sînevîzyoneke li ser pêvajoyên kompoyê hat pêşandan.

Bi heman armancê, rêxistina PYD`yê ya navçeya Çilaxa semînerek da. Semîner bi amadebûna şêniyên navçeyê li avahiya Çandê hat dayîn. Di dawiya de sînevîzyoneke di derbarê Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Ocalan hat pêşandan.

Li Reqayê jî bi dehan birîndarên şer ên Reqa, Tebqa û Minbicê, li dijî Komploya Navneteweyî derketin xwepêşandanê. Xwepêşandan ji pêşiya avahiya Mala Birîndaran a başûr rojavayê Reqayê dest pê kir. Birîndaran wêneyên Rêber Abdullah Ocalan hildan û heta qada Îtfaiye meşiyan û bi duruşmeya "Na ji Komploya Navneteweyî re, binbikeve Komploya 15`ê Sibatê" berz kirin.

Bi heman armancê, Meclisa Partiya Sûriya Pêşerojê ya rojhilatê Dêrazorê, panelek li avahiya Meclisa Gel a bajarokê Hecînê bi beşdariya endamên saziyên sivîl, bi dehan şênî, rûspî û serokeşîran li dar xist. Di dawiya panelê de, sînevizyonek têkildarî komployê û siyaseta dewleta Tirk a dagirker li dijî Rêber Abdullah Ocalan hate pêşandan.

Li Tebqayê jî oldaran bi daxuyaniyekê bang li saziyên olî û rêxistinên mafên mirovan ên cîhanê kir ku helwesteke diyar û rastîn a layîqî rêgezên mirovî û olî nîşan bidin, ji bo ku tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan bi dawî bibe û azadiya wî ya fîzîkî pêk were.

Bi sedan şêniyên navçeya Eyn Îsayê û koçberên Girê Spî jî, bi meşekê Komploya Navneteweyî ya 15`ê Sibatê ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan şermezar kir û banga azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan kir. Di çarçoveya çalakiyên li dijî Komploya Navneteweyî de, ciwanên herêma Firatê jî li dijî Komployê dest bi meşa dirêj kir û banga azadiya wî ya fîzîkî kir. Ciwan wê di 3 rojan de 20 kîlometreyan bimeşin.

# Rêxistin û tevgerên Kurdistanî Komploya Navneteweyî şermezar kirin

Bi wesîleya salvegera Komploya Navneteweyî tevger, partî û rêxistinên Kurdistanî daxuyanî dan û Komploya Navneteweyê ya li dijî Rêberê Abdulah Ocalan şermezar kirin. Herwiha banga geşkirina têkoşînê ya li dijî komployê kirin.




Navenda Nûçeyan

Bi wesîleya salvegera Komploya Navneteweyî ya 24'an gelek tevger, partî û rêxistinên Kurdistanê daxuyanî dan.

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê di salvegera 24'an a Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibatê de daxuyaniyek weşand û di daxuyaniya xwe de bang li gelê Kurdistanê, dostên gelê Kurd û hêzên demokratîk û şoreşgeran hemûyan kir ku nerazîbûna li dijî komployê hîn bi xurtir nîşan bidin. Herwiha bang li hêzên tevlî kompolya navneteweyî bûne kir, ku dest ji vê helwesta xwe berdin û piştgiriyê nedin polîtîkaya qirkirina Kurdan a desthilatdariya AKP-MHP'ê ya faşîst.

Di heman çarçoveyê de jî, Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) daxuyaniyek weşand û tê de kompolya navneteweyî şermezar kir. Herwiha bang li hemû hêzên siyasî, neteweyî yên Kurdistanê, Ereb û Suryan û rêxistinên civaka sivîl û tevahî beşên civakê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir ku, ji bo parastina nirxên Rêber Ocalan têkoşîn û berxwedanê geş bikin.

Koordînasyona PAJK'ê jî derbarê salvegera 25'an a Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, daxuyaniyeke nivîskî weşand. PAJK'ê da zanîn ku parastina Rêber Apo parastina azadiya jinê û mirovahiyê ye. Herwiha da xuyakirin ku divê di serî de jin, ciwan û gelê Kurd di sala 25'an ya Komployê de tekoşîna xwe bilindtir bikin.

Bi heman wesîleyê Navenda Parastina Gel (NPG) daxuyaniyek weşand û diyar kir ku Gerîlayên Azadiya Kurdistanê bi biryar in ku teqez Kompolya Navneteweyî bi hemû aliyan ve parçe bikin, erk û berpirsyariyên xwe yê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bi cih bînin.

Herwiha Tevgera Jinên Azad (TJA) bi daxuyaniyekê jî, daxuyaniyek weşand û bang kir ku divê têkoşîna ji bo azadiya Abdullah Ocalan li her derê were geşkirin û bal kişand ser keda mezin a ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye têkoşîna azadiya jinan.

Koordînasyona KJK'ê bi wesîleya salvegera Komploya Navneteweyî ya 15'ê Sibatê daxuyaniyek weşand û diyar kir ku divê ew di nav refên azadiyê de bibin yek, berxwedanê geş bikin û jiyana azad ava bikin. Hrwiha da zanîn ku li ser vê bingehê ew ê teqez Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêbertî, jin, gel hatî kirin, pûç bikin.

Tevgera Jinên Kurd a Ewropayê (TJK-E) jî bi heman wesîleyê daxuyaniyeke nivîskî weşand. TJA-E di daxuyaniya xwe de da zanîn ku Komploya li dijî Rêber Apo li dijî jinên azad, Kurdên azad û mirovahiyê ye, têkoşîna li dijî vê pêkanînê di şexsê Rêber Apo de parastina jina azad û civaka azad e.

# HPG: Êrîşên dewleta Tirk a dagirker dewam dikin

HPG'ê da xuyakirin ku artêşa Tirk a dagirker bi teknîk û çekên giran êrîşên xwe yên ser Gerîlayên Azadiyê yên ku di pozîsyona parastinê de ne, dewam dike.

**Navenda Nûçeyan**

Navend Çapemenî û Ragehandina HPG'ê derbarê êrîşên Artêşa Tirk a dagirker yên li ser qadên berxwedanê daxuyaniyek weşûand.

HPG'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku li hemberî Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê, ku di pozîsyona parastinê de ye, artêşa Tirk a dagirker bi teknîka giran êrîşan dewam dike. HPG'ê herwiha da zanîn ku Li gel êrişan jî hêzên gerîla pozîsyona xwe ya heyî diparêzin û li ser bingeha parastina rewa bersivê didin.

HPG'ê derbarê êrîşên dewleta Tirk yên li herêma Zapê wiha got: "13'ê Sibatê saet di 11:00 de li nehiya Şeladizê ya navçeya Amediyê, çeperên berxwedanê yên gerîla yên li qada Çemçoyê bi çekên giran ji aliyê dagirkeran ve hatin bombekirin. Hêzên me jî ji bo xwe biparêzin bi çekên giran bersiv dan. Li vir dagirkerek hate cezakirin û dagirkerek birîndar bû.

HPG'ê da xuyakirin ku di 13'ê Sibatê saet di 19:50'î de li nehiya Şeladizê ya navçeya Amediyê, li qada Çemçoyê dagirkeran bi çekên giran bombe li çeperên berxwedanê yên gerîla barandin û wiha domand: "Hêzên me ji bo xwe biparêzin bi sûîqestê bersiv dan dagirkeran. Li vir dagirkerek hate cezakirin."

HPG'ê diyar kir ku 13'ê Sibatê saet di 13:00 de li nehiya Şeladizê ya navçeya Amediyê, çeperên berxwedanê yên gerîla yên li nêzî gundê Sîdayê bi çekên giran hatin bombekirin. Herwiha ji bo ku hêzên gerîla xwe biparêzin bi çekên giran bersiv dan.




HPG'ê derbarê êrişên artêşa Tirk a dagirker ên bi çekên kîmyewî û bombeyên qedexekirî wiha got: "13'ê Sibatê çeperên me yên berxwedanê yên li nêzî gundê Sîda yê nehiya Şêladizê ya navçeya Amediyê carekê bi bombeyên qedexekirî hatin bombekirin. 13'ê Sibatê li nehiya Şeladizê ya navçeya Amediyê, çeperên me yên berxwedanê yên li dora qada Çemçoyê 4 caran bi helîkopterên êrîşê hatin bombekirin.13'ê Sibatê çeperên me yên berxwedanê yên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, Qada Çemço ya li nehiya Şeladizê ya navçeya Amediyê 38 caran bi obus, tank û çekên giran hatin bombekirin."


# KOMPLOYA MEZIN A GLADÎO

## Derketina Ji Sûrî(Beşê 2)

Berî ku ez behsa serhatiya xwe ya Atîna û Romayê bikim, divê em bêhtir ji nêz ve li dema beriya derketinê û dema derketinê binêrin. Ev gelekî girîng e û mirov dikare ji vê pêvajoyê Gelekî hîn bibe.

**Abdullah Ocalan**

Bi rastî ji bo Sûrî ev ne pêkan bû. Ji Bakur dewleta tirk, ji Başûr jî dewleta Îsraîl di



nava rojekê de karîbûn wê dagir bikin. Eger neketibûna nava panîkê, dikarîn ji bo min cihekî guncawtir bibînin... Jixwe helwesta Rûsyayê bêhtir bêrûmet bû. Di berdêla Projeya Herikîna Kesk û krediya deh mîlyar dolar a IMF'ê de em bi darêzorê ji Moskovayê derxistin.

**Tenê bi vê rêyê karîbûn Tirkiyê bê bandor bikin**

Berî ku ez behsa serhatiya xwe ya Atîna û Romayê bikim, divê em bêhtir ji nêz ve li dema beriya derketinê û dema derketinê binêrin. Ev gelekî girîng e û mirov dikare ji vê pêvajoyê gelekî hîn bibe.

Eger mirov rast li dualîteya darbeya 28'ê Sibatê serwext nebe, nikare fêhm bike ku çi diqewime. Milekî derbekar bi pêşniyareke rastî ya aştiyê nêzî me bibûn. Ez bawerim ku derbarê vê de di arşîva me de belge hene. Min bawer kiribû ku nêzîkatiyên wan jî, weke yên Turgut Ozal û Necmettin Erbakan ciddî ne û aştiyê dixwazin. Ev helwesta alîgirê çareseriya siyasî û aştiyane, rê li ber darbeya di nava darbeyê de vekiribû. Niha têra xwe eşkere bûye ku di wê demê de ango heta bi girtina min, Îsraîl û DYE'ê ji sedî sed alîgirê çareseriyeke siyasî û aştiyane nebûn e. Di asteke kêm de be jî, dewamkirina şer û bêçareserî hiştina pirsgirêka Kurd, bi israr di xwestin.

Ji bo berçavkirin(kontrolkirin) a Rojhilata Navîn û teybet jî, ji bo xistina Iraqê bi dijwarî pêdiviya wan bi vê hebû. Ji ber ku bi tenê, bi vê rêyê karîbûn Tirkiyê bê bandor bikin û pîlanên xwe pêk bînin.

Turgut Ozal, Necmettin Erbakan û Bulent Ecevît bi sedema ku guh nedan van pîlanan û bêhtir bûn xwedî helwesteke Anatolîparêz, mîllîgir û di pirsgirêka Kurd de bûn alîgirê çareseriyeke siyasî û aştiyane, lewma ji desthilatdariyê hatin xistin.

Ji bo alîgirên şer pirr girîng nîne ku wexta kesên behskirî ji desthilatdariyê dixin, ew kesana bêne kuştin an neyên kuştin. Jixwe di nava şer de ne. Bi şer, dixwestin heta dawiyê biçin û eger astengiyek derkeve pêşiya wan, biqulipînin û bi vî awayî bigihîjin armanca xwe. Di nava van astengiyan de pirsgirêka Kurd jî hebû. Di fikirîn ku bi rêya leşkerî bi giştî tasfiye bikin, ango bi awayekî qirkirina Kurdan jî difikirîn. Eger hêzên hegemonîk pişta vê têgihiştina dewama xeta Îttîhad û Teraqîgirên berê negirtiba ye, tu carî şensê wan ê serketinê tinebû. Wan jî dizanî ku ji sedî sed hewcedariya wan bi piştgiriya DYE, Ingilistan û Îsraîlê heye.

**Di warê leşkeri de peymanên hevkariyê yên stratejîk pek anîbûn**

Destaka pêvîst ya ji bo derketina min ya ji Sûriyê (1998'an) de, ji bo Tirkiyê hatibû kirin.

Di serê salên 1990'î de desteka DYE û Ingilistanê, di sala 1996'an de jî desteka mutleq a Îsraîlê (Di navbera Îsraîl û Tirkiyê de, di warê leşkeri de peymanên hevkariyê yên stratejîk) pêk anîbûn. Piştî ku alikariya pêvîst hatî kirin, dor hatibû destwerdana hundir. Ango guhartina hukumetê ya pêvîst û di nava artêşê de jî kesên dixwastin wê wê ji holê rakiriban.


Ji serê salên 1990'î ve wê ev jî gav bi gav bi cih bianiyana. Dogan Gureş ê wezîfeya Serokatiya Giştî ya Fermandariyê dewr wergirtî, pêşî çûn serdana Ingilistanê û di dema vegera xwe ya ji vî welatî de got "Ji bo ji holê rakirina PKK'ê ji me re lampeya kesk vêxistin" ev gotina wî jî rastiya ku em behsa wê dikin, ispat dike. Em dizanin ku di wê pêvajoyê de, tenê bi êrîşên ji holê rakirina Kurdan û PKK'ê razî nabun! Serokkomar dikujin, di nava hukûmetê de guhertinan dikin, di nava artêşê de tesfiyeyê dimeşînin, tevgerên ku civakê bê bandor bikin, bi rêxistin dikin, li dijî rewşenbîr û karsazan rêzeke reşkujiyên pêk tînin û heta bi pîlankirina komkujiyên girseyî û radestgirtina medyayê, gelek bûyerên xeternak û şer xistin rojevê. Herwiha divê mirov van hemûyan weke bûyerên zincîrwarî yên bi hev ve girêdayî fêhm bike.

**Li dijî daxwazên gel yên azadiyê şerekî NATO'yê destpêkiriye**

Ji roja ku Tirkiyê kete nava NATO'yê heta 1998'an, di bingehê tevahiya bûyerên siyasî û civakî yên li Tirkiyê heta ku mirov xeta stûr a NATO-Gladîo nebîne, nikare ti bûyera girîng, şer û reşkujiyan ji hev derxe. Li dijî daxwazên gel yên ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê, şerekî NATO'yê dest pê kiriye û weke xeleka dawî derxistina min a ji Sûrî di sala 1998'an de, li vî şerî hatiye zêdekirin.

Di dema derketina ji Sûrî de du rê li pêşiya min hebûn: Ya yekê riya çiyê bû, ya dudiyan jî riya Ewrûpayê bû. Eger min riya çiyê hilbijarta wê şer dijwar bibûye û eger min rêya Ewrûpayê hilbijartiba ev jî dihat wê wateyê ku ez li vebijêrka çareseriya dîplomatîk û polîtîk digerim. Çawa ku tê zanîn, amadekariyên ji bo riya çiyê ji zû ve dest pê kiribûn. Derketina çiyê îhtîmala xurt bû. Lê tam di wê pêlê de heyeteke Yewnanî hat cem me. Nûnera me ya Atînayê Ayfer Kaya gelek têkiliyên telefonî bi rayedarên di asta jor de danîbûn. Di encama van têkiliyan de heyeta Yewnan bu sedem ku em berê xwe bidin Atînayê. Derdê rayedarên Sûrî ew bû ku ez bi lez derkevim. Lê ji çûna min a Ewrûpayê zêde ne dilrehet bûn. Di vê mijarê de alternatîf neafirandin û ev kêmahiya wan ya cîddî bû.

**(Ji Pirtûka parêznameyên Rêber Apo, cîldê 5`an beşê 5)**



**Salvegera 24'an a 'Roja Reş'**

**Ahmet AKTAŞ**

Hêvî û bawerî ji her demê xurtir bûye ku ew "Roja Reş", li xwediyê xwe dizîvir. Ji bo gelê Kurdistanê û mirovahiya cîhanê jî, ROJÊN XWEŞ nêziktir bûne. Rojên li gel Rêber APO li Kurdistana azad ne dûr in!

Di 15'ê Sibata 1999'an de, Rêber APO li Kenyayê dîl hat girtin û radestî dewleta Tirkiyeyê hat kirin. Di encama plangeriyek KOMPLOYEK mezin û berfireh de ev bûyera rûreş a cîhanî pêk hat. Pêşengê wê DYE, Israil û Inglistan bûn. Bi hevkariya gelek hevalbendên xwe, yên mîna Misir, Yewnanistan û gelek dewletên Ewrupa yên din, ev plangeriya cîhanî pêk anîn. Divê rola xiyaneta Kurdî jî neyê jibîrkirin. Lewra ev êrîşa li dijî Rêber APO, ne tenê ji alîyê dewletekê ve, belê di asta hevalbendiyek cîhanî de pêk hat. Ewqas pir dewlet beşdarî vê êrîşa bêexlaq û dijî mirovahiyê bûne, nav û hilwestên wan, di gotarên wisa de hilnayên!

Armanca vê êrîşê/plangeriyê, ewqas berfireh û balkêş e; gelek dewletên ku dijberî hevbûn, ji bo dilgirtina Rêbar APO siyasetek hevpar dan meşandin. Hema mînaka herî mezin, DYE û Rûsya ku serwerên cîhanîne, li ser vê 'plangeriya qirêj' bûn hevkar. Her wiha mînaka biçûk û ya herî nêz jî Yewnanistan û Tirkiye ku xwedêgiravî dujminên hevdu yên dîrokîne, ew jî di plangeriya cîhanî ya dijberî Rêber APO de bûn hevkar! Çima ?

Ji ber ku ne bi tenê felsefeya Rêber Apo belê pergala wî jî, ji zihniyet û pergala xwe ya giştî alternatif di dîtin.

Bêgûman ev hevkariya ewqas mezin a cîhanî ya dijber, yekser mezinbûna felsefe û zihniyeta wî jî dide diyarkirin. Her wiha, tirsa van ewqas hijmara zêde ya dewletên cîhanê, ya ji heybeta bandora felsefeya Rêber Abdullah û ji paradigma Wî jî dide der.

Di vê tirsê de neheq nebûn, ew zirdewletên cîhanê ên ewqas bi navû deng!

Jber ku dema dîlgirtina Rêber Apo hat bihîstin, Kurdistaniyên her deverê; yên çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat, bi yek dengî û bi yek rengî rabûn ser pîyan û li Rêberê xwe xwedî derketin.

Lê, ne hema xwedîderketinek wisa ji rêzê de bû; bi zanistî û canbexşanê rabûn, derketin qadên berxwedanê û bi dehan çalakiyên cangorî pêkanîn.

Çalakiyên wisa, heta niha li tu deverê cîhanê nehatibûn dîtin. Helbet vê helwesta xwedîderketina di asta evîndariya bi Rêber APO re, desthilatên dewletên planger/kompolger tirsand in.

Mînak, li himber van çalakiyan, Wezîra Derve ya DYE'yê (Madeleine Albright) xwe ranegirt û li xwe mikur hat û got, 'Me bawer nedikir ku gelê Kurdistanê ewqas li Abdullah Ocalan xwedî derkeve!'

Her wiha Serokwezîrê Tirkiyeyê Ecevit jî, weke ku sergêj bûbe piştî salekê got, 'Ez hîn jî nizanim, çima Abdullah Ocalan radestî me kirin?'

Lê belê niha gelê Kurdistanê û dostên wan, baştir di zanin ku neyarên Kurdistanê û mirovahiyê kî ye û kî nin!

Çawa vê êrîşê weke plangeriyek hevkariya cîhanî despêkir û dimeşe, dijberî vê plangeriyê jî niha di asta cîhanê de. Weke platformek hevkariya navneteweyî têkoşîn û xebat tê meşandin. Her wiha hêvî û bawerî ji her demê xurtir bûye ku ew "Roja Reş", êdî li xwediyê xwe dizîvire; berovajî ji bo gelê Kurdistanê û mirovahiya cîhanê jî, ROJÊN XWEŞ nêziktir bûne. Rojên li gel Rêber APO li Kurdistana azad ne dûr in!



# 'Armanaca Kompioya Navneteweyî têkbirina rihê serkeftinê bû'

Rêveberê Destgeha Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê diyar kir ku armanca Komploya Navneteweyî tekbirina rihê serkeftinê yê ku Rêber Apo di gelên bindest de afirandi ye û got, Rêberê ku bi milyona mirov li ser fikrê wî dimeşin tekez wê fîzkî jî azad bibe.

**Navenda Nûçeyan**

Di 15'ê Sibata 1999'an de, di encama Komploya Navneteweyî de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Kenyayê hat revandin û radestî dewleta Tirk a dagirker hat kirin. Di komployê de gelek hêzên navneteweyî û herêmî jî, beşdar bûn. Ji wê demê û heta niha Rêber Ocalan bê navber tê tecrîdkirin, hevdîtinên bi malbat û parêzeran re jî hatine qede[...]xekirin. Ji bo ra[...]kirina Tecrîdê [...] û azadiya [...] Rêber Ocalan [...] gelê Kurd [...] û



azadîxwazên cîhanê, herdem li qadaninin û hêrsa wan ya li dijî komplogeran gihiştiye lûtkeyê. Hejayî bîraninê ye ku herî dawî welatparêzên Kurd yên Bakurê Kurdistanê Veysî Taş û Mihemed Akar jî, ji bo rakirina tecrîdê laşê xwe dan ber agir û şehîd bûn.

Derbarê salvegera Komploya Navneteweyî rêveberê Destgeha Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê, ji rojnameya me re axivî.

Kadar Pîrê diyar kir ku beriya mirov bipirse çima Komployeke navneteweyî li ser Rêber Abdullah Ocalan çêbûye, divê mirov li pêşiya gelek pirs û banîşanan bisekine û axiftina xwe wiha domand: "Rêber Ocalan ne tenê Rêber e, ew fîlozof û ramangere jî. Ne tenê ji bo azadiya gelê Kurd têkoşînê dike, ji bo tevahiya gelên bindest tekoşîn dike. Fikr û felsefeya azad ya Rêber Ocelan ji bo gelê Kurd û tevahiya gelên bidest bû çira azadiyê. Projeya Rêber Abdullah Ocelan ya Neteweya Demokratîk, li ser bingeha xwiş û biratiyan gelan, wekhevî, demokrasî û adalet di nava civaka Kurd e pêş xist. Armanca sereke ya komployê, tekbirina projeyên demokratîk û rihê serkeftinê yê ku Rêber Apo di gelên bindest de afirandi ye."

**'Mirovê ku rihê serkeftinê di gelê xwe afirandiye, teslîm nabe'**

Kader Pîrê da zanîn ku ji ber tirsa komplogeran ya ji belavbûna fikrên azad, tecrîda giran li ser Rêber Ocalan ferz dikin û wiha got: "Ji ber tirsa hêzên desthilatdar yên komoploger ji fikrên Rêber Ocalan, ev 24 salin tecrîdê li ser feriz dikin. Ji tevahiya mafên xwe yên mirovî bê par maye. Dewleta Tirk a dagirker baş dizane ku kesê îradeya serkeftinê di gelê xwe de afirandiye, tu caran bin nakeve. Lewma her ku diçe tecrîdê girantir dike û hewil dide Îradeya gelê Kurd têk bibe."

**'Fikrên Rêber Ocalan li cîhanê belav bûye'**

Pîrê da zanîn ku armancên Kompoloya Navneteweyî ya li ser rêber Apo têkbirina fikrên azad bû û got, Tevî ku Rêber Apo fîzikî di gîrtîgeha Îmraliyê de dîl girtiye jî, fikr û felsefeya wî li her devêrê cîhanê belav bûye û ji gelên bindest re bûye çira azadî û serkeftinê. Gelek rewşenbîr û hiquqnasên ji gelên cûda dibêjin; 'Cihê serbilndayiyê ye ji gelê Kurd re ku Rêber Ocalan Kurd e, tevî ku ew Kurde lê ji bo azadiya tevahiya gelên bidest têkoşînê dimeşîn e. Ew kilîta çareseriya pirsgirêkên bêçare yên Rojhilata Navîn û cîhanê ye.'"

**'Rola hêzên navneteweyî di komployê de sereke bû'**

Pîrê da xuyakirin ku hêzên komploger bi revandina Rêber Ocalan ji Kenya yê tevahiya zagonên navneteweyî bin pê kirin û wiha got: "Di kompioya Navneteweyî de gelek hêzên navneteweyî beşdar bûn . Van hêzan bi revandina Rêber Ocalan ji paytexta Kenyayê (Nîrobiyê) tevahiya zagonên navneteweyî bin pê kirin. Herwiha dadgehên Tirkiyê di dema dadgehkirina Rêber Ocalan de, ne zagonên navneteweyî û ne yên Tirkiyê, pêk anîn. Jixwe ne qanûni ye ku Rêber Ocalan bê dadgehkirin. Ji ber ku Rêber Ocalan Gelê Kurd bi giştî temsîl dike û nabe gelek bê dadgehkirin. Hêzên Rojavayî ku qaşo bi navê demokrasiyê bang dikin, ji bo berjewendiyên xwe bûn hevkarê komployê û di qirkirina gelê Kurd de xwedî rolin."

**'Divê gelê Kurd û azadîxwazên cîhanê têkoşînê bilind bikin'**


Rêveberê Destgeha Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê da xuyakirin ku Rêberê ji bo azadiya wî mirov canê xwe didin ber agir û bi milyonan mirov li ser fikrê wî kar û xebatan dimeşînin, tekez wê fîzîkî jî azad bibe û wiha axiftina xwe qedand: "Bi dehan mirovan ji bo azadiya Rêber Ocalan canê xwe dan ber agir û şehîd bûn, bi hezaran mirov jî li ser fikrên wî ji bo azadiyê tevlê nava refên leşkerî dibin; bi milyonan mirov bi felsefeya wî tevdigerin û xebatê dikin. Ji ber wê Rêberê ku ewqas bandor kiriye û hîn jî dike, tekez wê fîzîkî jî azad bibe. Ji her demê zêdetir ji gelê kurd û gelên azadîxwaz tê xwestin ku ji bo azadiya Rêber Ocalan asta têkoşînê bilind bikin, gelê Kurd û azadîxwazên cîhanê deyndarên Rêber Apo ne û divê ji bo azadiya rêber Ocalan yek deqeyê ranewestin."

# 'Berxwedana xeta Apoyî armanca Komployê têk bir'

**Zana Roj/ Şehba**

**Endamê Saziya Malbatên Şehîdan yê herêma Efrînê Ednan Şêx Mihemed da zanîn ku Rêber Ocalan bi pirojeya xwe ya azadiya gelan bû rêberê gelên azadîxwaz yên cîhanê û got, ji ber ku Rêber Apo gelên azadîxwaz temsîl dike bû armanca hêzên desthilatdar yên ku li ser xwîna gelan jiyan dikin.**

Derbarê salvegera 24'an ya



Komploya Navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan endamê Meclisa Saziya Malbatên Şehîdan ya herêma Efrînê Ednan Şêx Mihemed, ji rojnameya me re axivî.

Ednan diyar kir ku hêzên komploger bi riya Kompiloya Navneteweyî xwestin cîhanê ji fikrên azad û demokrasiyê qut bikin û wiha domand: "Di sedsala 21'an de vejîna raman û fikrên demokrasî yên ji bo azadiya gelan derket holê, ji bo têkbirina fikrên kapîtalîzmê û azadiya gelan, fîlozof û Rêberê Gelan yê serdemê Rêber Ocalan felsefeya azadiyê li cîhanê belav kir. Lê ji bo ku felsefeya wî nekeve xizmeta gelan de, hêzên desthilatdar li hember Komployekê ku dîrok li hember şerim bike, pêk anîn û Rêber Apo radestî dewleta Tirk a dagirker kirin."

**'Destê PDK'ê jî di Komployê de hebû'**


Ednan anî ziman ku ji ber Rêber Ocalan neket bin xizmeta sîstemên navneteweyî yên desthilatdar de,



hêzên navneteweyî bi hemû hêza xwe li hember raman û fikrên Rêbertî sekinînin û wiha domand: "Di dîrokê de gelek kesayetên kurd ji doza azadiya gelê Kurd derketin û têkoşîn kirin e. Piraniya wan jî, bi destên dijminên Kurdan û bi alîkariya hin kurdên xayîn hatin tesfiye kirin. Partiya Demokrata Kurdistan PDK'ê jî mînaka Kurdên xayîn e ku ji ber wê ji aliyê dijminê Kurdan ve tê qebûl kirin. Herwiha rola wê di Komploya Navneteweyî de jî hebû. Rêber Ocalan bi pirojeya xwe ya Netewa Demokratîk ne tenê doza azadiya Kurdistanê dide meşandin, ji bo tavahî gelên bindest bû riya azadiyê ."

**'Tevgera Apoyî bi xwînê hatiye avdan, gav paşda avêtin ne pêkan e'**

Endamê Saziya Malbatên Şehîdan Ednan Şêx Mihemed tekez kir ku tesfiyakirina Pergala Azadiyê wê ne pêkan be û axiftina xwe wiha bi dawî kir: "Armanca hêzên kompiloger ew e ku îdeolojî û xeta ku Rêber Ocalan ji me re daye diyarkirin, pûç bikin. Lê bi xabat û destkeftiyên ku hatine bidesxistin, tavahî cîhan û di serî de dijminên xeta azadiyê tekez kirin ku armanca Komploya Navnetewî vala hat derxistin. Em ê careke din ji cîhanê re tekez bikin ku riya azadiyê û Tevgera Apoyî bi xwînê hatiye avdan û gav paş ve avêtin ne pêkane."



**Hebûna wan ne ji bo aramiya civakê ye!**

**Dilyar Cizîrî**

Di berbanga roja 6'ê sibatê de xelk di xewnên pêşerojê de bû. Gelê Sûriyê di xwenên xwe de dît ku piştî şerê 12 salan, aramî pêk were; êş û azerên wan hemû çareser bibin. Her kes vegere warê xwe!

Gelê Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê jî di xewna xwe de dîtin, şerê 40 salî radiweste. Aramî pêk tê û hemû pirsgirkên wan ên aborî, civakî û siyasî çareser dibin. Di kêliyên xewnan de erd hejiya! Di kêliyekê de mirinê bayê zivistana sar himbêz kir û li her derê belav bû. Her kes li nav hev ket, êdî kes nema kesî nas kir. Bobelatek bi êş û herî dijwar bû. Li gorî daneyan nêzî 40 hezar kesî jiyana xwe ji dest daye û bi 100 hezaran kes hê jî di bin kavila de ne. Bi deh hezaran jî birîndar bûne. Gelek kesên di giraniya xewnên xwe de man, hîn û hîn jî windane.

Di roja yekem a bobelatê de her kes matmayî mabû û kesî bawer ne dikir xezeba erdê ewqas dijwar e. Her kesî kêliyên bi êş û dijwar jiyan kirin. Ên dûr jî di bin bandora dîmen û wêneyên ji cihên bobelatê di hindirê xwe de êşiya û hîn jî dêşe.

Di rewşeke wiha de KCK'ê banga sekinandina çalekiyan li hemû hêzên leşkerî kir. NPG'ê demil dest bersiv da û rawestandina hemû çalakiyan ragihand. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê tankerên alîkariyan anîn dergeha sînorê di navbera herêmên Rêveberiya Xweser û herêmên di bin dagirkiriya dewleta Tirk û çeteyên wê de, xwest ew alîkariyê zûtirîn dem de bighêjin xelkê.

Komên çete rê ne dan ew alîkarî derbasî herêmên bombelatê werin kirin. Ew alîkariyên piraniya wê sotemenî bû, di saetên destpêkê de ji bo xebitandina kepçer û alavên rizgarkirina kesên asê mabûn, pir giring bû. Lê ne hiştin ew derbas bibin. Ev jî bû sedema hejmara mirinan hîn zêdetir bibin.

Di heman demê de dewleta Tirk a şûna rawestandina çalakiyan a KCK'ê erênî bibersivîne, berûvajî vê êrişên xwe dewam kir. Êrişên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyayê jî dewam kir. Bi balafirên bê mirov, top û her wekî din êrişa li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê dewam kirin.

Li aliyê din jî di mijara rizgarkirinê û belavkirina alîkariyan de pir nijatperestî, cûdaxwazî û her rêbazên kirêt hatin meşandin. Ev bi taybet li dijî xelkên Sûriyayê û li herêmên Kurdistanê jî heman tişt hate kirin. Li herêmên di bin dagirkirina dewleta Tirk û bi taybet li Cindirêsê, dîmenên pir bi êş derketin. Di wir de jî aşkere diyar bû, kurd hatine paşguhkirin, alîkarî li wan nayên belavkirin. Heta di mijara xebatên rizgarkirin û veşartina cenazeyên miriyan de jî, ev cûdaxwazî pir li pêş bû.

Me jî wisa hêvî dikir ku piştî vê erdhejê û bobelata bi serê xelkê hatî, wê rayedarên dewleta Tirk, komên çeteyên girêdayî wan û heta hikûmeta Şamê, di nerîna xwe de hinek guhertin çê bikin. Lê mixabin diyare ku hişmendiya serdest û dagirkeran tu car nayê guhartin. Lewma hebûna wan ne ji bo aramiya civakê ye!